**Ronahî** — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1092 | 20-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165

# Bi pênûsa xwe kêliyan vedigerîne tabloyan

Danyar wênesazekê li Germiyanê ye ku hunera xwe ji ode û salonên taybet derdixîne ser rêyên qerebalix. Hem bala mirovên derdor dikşîne û jêhatin û hêza xwe nîşanî derdor dide, hem jî bi vê yekê debara jiyana xwe dabîn dike. Her kesê ku bixwaze li pêşberî Danyar dirûne û Danyar jî wê kêliyê bi pênûsa xwe wêneyê wî kesê li ser kaxezê dinexşîne û dike tabloyek hunerî.



Dema ku mirov li nav parka Dayîk a li bajarokê Kelar a navenda îdareya Germiyanê digere, li nav qerebalix û gengeşeya xelk de, ciwanek ku li quncikek rûniştiye û tabloyên hunerî xêzdike bala mirov dikişîne. Ew ciwan Danyar Yehya ye. Danyar 27 saliye û xelkê bajarokê Kelar a navenda îdareya Germiyanê ye. Di sala 2011'yan de dest bi wênesaziya bi şêweyê reş û spî, kiriye û beşdarî gelek pêşengehên hunerî bûye. Lê ji ber karkirinê demekê ji hunerê dur ket.

Danyar di sala 2018'yan de carekê din li dildariya xwe vedigere û nahêle zorî û zehmetiyên demê jêhatina wî asteng bike. Vê carê ji hemû caran zêdetir bi coş û kelecanekê destpê dike û şêwazek taybet dide hunera xwe. Danyar hunera xwe tîne kolanên qelebalix û di nav gel de tabloyên zindî xêz dike.

Ji bo vê yekê Danyar destpêkê beşdarî kursa hunerê dibe û xwe fêr dike. Danyar bi xwe wiha dibêje:"Min hinek tabloyan ciwan dît û min ferq kir ku xwesteka min ya ji bo wênesaziyê zêdetire ku ez dikarin di nava wênesaziyê de hîn zêdetir xwe pêşbixim û fêr bibim. Wênesazî li çend beşên cuda yên weke run, mahî, grafîk û kumire (reş û spî). Beşa kumir ango wêneyên bi şêwazê rewş û spî bala min kêşa û min wê hilbijart. Ji ber ku min hêza xwe hîn zêdetir di wê de dît û dikarim baştir wêneyan wek rastî xêz bikim."

Ciwanê wênesaz Danyar raste rast li herêmên giştî wêneyê welatiyan dikêşe, lê ji ber zelaliyên di nav wêneyan de demek diyar yê wê nîne, heta ku welatî li benda temambûna wêneyê bimînin. Her wiha li bajar û navçeyên din jî xelk bi rêya torên medya civakî wêneyên xwe dişînin û piştî wêneyên wan çêdike ji bo wan dişîne.

Armanca Danyar li gel debara jiyana xwe dabînkirinê ewe ku hêz û jêhatina xwe ya hunerî pêş bixe û dixwaze kêliyên hunerî bêxe ser rêyan, hezkirina hunerî li gel welatiyên bajarok ava bike. Dayar herî dawî wiha dibêje:"Taboyên xwe tînin û li ser rê pêşkêş dikim. Bi vê yekê welatî her rojê li ser rê pêşengehek hunerî dibînin."

**ROJNEWS**



# Ji bo zarokên xwe yarîgeh çêkir

**Şêniyên gundê Sehil bi xebateke komînal parkek li gundê xwe çêkir û cihekî guncaw ji bo zarokan peyda kir, ji bo ku lê bilîzin.**



Gundê Sehil li başûrê navçeya Tirbespiyê ye û girêdayî bajarokê Til Marûf e. Komîna gund yek ji komînên serkeftî yên herêmê ye ku gelek xebatan ji xelkê gund re pêşkêş dike û bi rêya komînê karê xwe bi rêxistin dikin.

Komîn, şaneyên sereke yên birêxistinkirina civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye û bingeha Rêveberiya Xweser e. Her wiha ew yek ji berhemên ramanên Rêber Abdullah Ocalan e ku armanca wê gel xwe bi xwe bi rê ve bibe û dûrî desthilata dewleta navendî rêgeza xwetêrkirinê û xebatan peyda bike.

Komîna Şehîd Dîrok a gundê Sehil di 2014'an de hate avakirin û ji wê demê de gelek proje bi awayekî komînal bi xelkê gund re çêkirine.

Parka Rêber Apo ya li navenda gund yek ji destkeftiyên Komîna Şehîd Dîrok e ku di encama hevkariya Şaredariya Gel a Til Marûf de piştî demeke kurt ji avakirina komînê hat avakirin.

Endama Komîteya Jinan a Meclisa Bajarokê Til Marûf û endama Komîna Şehîd Dîrok Xaliye Ehmed got wan ji bo rêzgirtina ji fikrên Rêber Apo re, navê wî li parkê kir.

Xaliye wiha domand: "Me cihekî guncaw ji bo zarokan jî peyda kir da ku tê de bilîzin û em hezt dikin ku me tiştekî mezin ji bo gundê xwe kiriye."

Şêniyên gund pev re girîngiyê didin parkê, darên wê av didin û li amûr û lîstikên zarokan dinêrin, her wiha di parkê de kursiyên ji bo kesên mezin jî hene.

Xaliye destnîşan kir ku hevkariya di navbera komînan û saziyên Rêveberiya Xweser de roleke mezin di pêşkêşkirina xebatan de lîst û gundê xwe wek mînak li ser vê mijarê, bi bîr xist.

Xaliye hêvî kir ku komîna gundê wan bibe nimûne ji tevahî gundên din re, ji bo ku xebatên komînal bikin û dar û beran zêde bikin.

### Sudoku: Bersiv 2

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 5 | 3 | 2 | 1 | 6 | 7 | 8 | 4 |
| 7 | 2 | 1 | 8 | 4 | 9 | 3 | 6 | 5 |
| 4 | 8 | 6 | 3 | 7 | 5 | 2 | 1 | 9 |
| 8 | 4 | 9 | 7 | 6 | 3 | 5 | 2 | 1 |
| 6 | 7 | 5 | 1 | 2 | 8 | 9 | 4 | 3 |
| 3 | 1 | 2 | 5 | 9 | 4 | 8 | 7 | 6 |
| 1 | 3 | 4 | 9 | 8 | 7 | 6 | 5 | 2 |
| 5 | 6 | 7 | 4 | 3 | 2 | 1 | 9 | 8 |
| 2 | 9 | 8 | 6 | 5 | 1 | 4 | 3 | 7 |

### Sudoku:Pirs 3

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | 3 | | 8 | |
| | 7 | | | | 4 | 2 | 5 | |
| | | | | | | | 4 | 7 |
| 6 | | | | 2 | 7 | | 1 | |
| 8 | | 2 | | | | 7 | | 5 |
| | 4 | | 6 | 8 | | | | 3 |
| 4 | 8 | | | | | | | |
| | 6 | 7 | 4 | | | | 3 | |
| | 5 | | 2 | | | | | 6 |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Agir berdide kayê xwe dide ber bayê:**
-Mirovekî xemsar e; tişt jê re ne derd in.
**Agir berda malê xwe da palê:**
Bi heman wateyê.
**Agir pê bikeve bi xwe nahese:**
Xemsar e; tişt jê re ne girîng in.
**Agir pê bikeve bêhna pîso jê nayê:**
Bi heman wateyê.
**Avêt pişt guhê xwe:**
Girîng nedît; jê re ne xem bû; lê nebû xwedî; mişemir hişt; baş nekir; seresere kir.
Axa ji xulam re got, xulam ji kûçik re got, kûçik jî ji dêliya xwe re got
Ji xemsarî kar pêk nehat; girîng nehat dîtin; bi ser guhê xwe ra avêt.
**Bi aqilê xwe keyf kiriye:**
Xema tiştekî naxwe; xemsar e.
**Bi guh re ye:**
Xemsar e; tiştan ser guhê xwe re diavêje.
**Ber guhê xwe re girt:**
Girîngî nedayê; xemsarî kir.
**Ber guhê xwe re kir:**
Bi heman wateyê.
**Çavên wî tiştekî nabînin:**
Girîngiyê nade tiştan; mirovekî xemsar e.
**Çawa ku tirek jê filitîbe:**
Tiştek ne li xema wî ye.
Dema titî (heywanek e) sar dibe, **dibêje ezê xaniyekî ji xwe re bigirim:**
Heta nekeve tengiyê bi xwe nahese; heta nekeve tengiyê tiştek nayê bîrê.
Destê xwe di ava sar û germ de **nake/destê xwe naxe ava sar û germ:**
Ne sivik ne giran karekî nake; tevlî tiştekî nabe; xemsar e.
**Di guhê gê/ga de ye:**
Tiştan zû nabihîze; dinya xirab bibe pê nahese; haya wî ji tiştekî nîne.
**Dinya xirab bibe nabêje ax serê min:**
Bi heman wateyê.
**Dinê bi dinê ve Mendo bi jinê ve:**
Her kes bi tiştên girîng ve mijûl e ew li pey tiştên pûç ketiye.
**Dinya li cem çardehê Nîsanê ye:**
Xema tiştekî naxwe; mirovekî xemsar e; çi biqewime ne li xema wî ye.
**Di çav de mirî ye:**
Xemsar e; ne baş ne xirab têkiliya xwe bi tiştekî nayne.
**Du berû barê kerekî:**
Bêxem e; derdê tiştekî naxwe.
**Em li ser piştê hiştin:**
Em di nava pirsgirêkan de hiştin; dev ji me berda.
**Ettehiyato çawa lê hato:**
Bê amadekarî; seresere; çawa rast were; çawa lê were.
**Garan hat zeviyê jina gavên nû bezî teşiyê:**
Detpêkê girîngî neda karê xwe heta karekî din derket nû pê ve çû.
**Garan hat zeviyê jina gavên nû dest avêt teşiyê:**
Bi heman wateyê.
Garan hat zeviyê, bûka malê nû **bezî teşiyê:**
Bi heman wateyê.

## 'Beyannameya Rêveberiya Xweser bingeha çaresekirina kirîza Sûriyê ye'



Ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê bi 10'an civînên navneteweyî hatine li darxistin, lê ji ber berjewendiyên hêzên navneteweyî, tu çareserî nehatiye dîtin. Hevserokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê,Telal Mihemed diyar kir ku beyannameya Rêveberiya Xweser bingeha çareserkirina kirîza Sûriyê ye.**R-4**

**Ronahî** — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1092 | 20-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# AZADIYA RÊBER APO AZADÎ Û RÛMETA MIROVAHIYÊ YE

Bi bêdengiya sazî û çapemeniya Ewropayê, tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan berdewam e, akademisyanê Îtalî Federico Venturini diyar kir ku azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan têkoşîna azadî û rûmetê ya hemû mirovan e.**R-3**




## Pirojeya Heyva Sor A Kurd a kolandina bîrên avê li Şehbayê dest pê kir

Li herêma Şehbayê kêmbûna avê bûye pirsgirêkeke giştî, ji ber tunebûna sotemeniyê rêjeya derxistina avê jî kêm bûye. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kêmbûna avê, Heyva Sor A Kurd li herêma Şehbayê dest bi pirojeya kolandina bîran û avakirina navendên derxistina avê kirin e.**R-5**



ROJA RÛMETÊ; 15'Ê TEBAXÊ
Zozan CIZÎRÎ R-2

## Star FM dengê jin û jiyanê

Radiyoya Star FM Yekemîn radiyoya xweser ku di sala 2017`an de li bajarê Tirbespiyê ji hêla jinan ve hat vekirin, rêvebera radiyoya Star FM Lîlav Hesen diyar kir ku radiyoya Star FM deng, hest û nasnameya jinan ne. **R-2**

## Pirtûkxaneya Amara cihê pêşxistina xwendinê ye



Pirtûkxaneya Amara a li bajarê Qamişlo, bi şoreşa 19`ê Tîrmehê re, bûye cihê hezkirin, xwendinê û gotûbêjên rewşenbîr û nivîskaran. Di pirtûkxaneyê de nêzî 5 hezar pirtûk hene, beşek jê berhemên nivîskarên Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê ne û beşê din jî, ji derveyî heremê hatine peydakirin.**R-6**

# Star FM dengê jin û jiyanê

Radiyoya Star FM Yekemîn radiyoya xweser ku di sala 2017`an de li bajarê Tirbespiyê ji hêla jinan ve hat vekirin, rêvebera radiyoya Star FM Lîlav Hesen diyar kir ku radiyoya Star FM deng, hest û nasnameya jinan ne.

**Ciwana Mûsa / Qamişlo**

Radiyoya Star FM 15'ê Kanûna 2017`an de dest bi weşana xwe kir. Radiyoya star FM li tevahiya rojhlata navîn ku yekemîn radiyo bi dengê jin weşanê dike, di demên pêşî de tenê li ser asta bajarê Tirbespiyê û gundewarên wê dihat kişandind û guhdarkirin, lê bi demê re Star FM weşana xwe li ser asta herêma Cizîrê bi giştî berfireh kir, ji bajarê Dêrikê heya Hesekê, her wiha li gundên Bakurê kurdistanê yên li ser sînor jî guhdarê wê hene .Rêze bernameyên radiyoyê bi giştî siyasî, civakî, hunerî, nûçeyên kurdî Erebî û bernameyên zarokan jî, digire nava xwe. Weşana Star FM jî bi 2 zimanan ne; zimanê Erebî û Kurdî. Ji demjimêr 7`ê sibehê heya 10 êvarî dewam dike, rojane sê caran nûçeyên kurdî, erebî û di nava seatê de jî bernameyên cûrbicûr têne pêşkêş kirin, naveroka van bernameyan bi giştî girêdayî jinan ne. Star FM radyoeke xwesere weşana wê bi deng, reng û hestên jinan ne. Derbarê kar û xebatên radiyoya Star FM, yek ji rêveberên radiyoyê, Lîlav Hesen ji rojnameya me re axivî.

**Hest û rola jinê di radiyoyê de**

Lîlav Hesen diyar kir ku akîpa Star



FM bi tevahî jin in û wiha got: "Ez yek ji wan kesên ku ji destpêka vekirina radiyo ve, tê de kar dikim, bi rastî mirov nikare hestên xwe bîne ziman, hestekî pir cûda ye, ji ber ku weke me dît di Şoreşa Rojava de, jinan di hemî qadên siyasî, civakî û leşkerî de cih girtin, ji bo çareseriya pirsgirêka vî welatî em dibînin ku siyastmedarê me yê jin bi serokwezîrê dewletan re rûdinin, şervanên jin yên ku DAIŞ'ê têk birin, ji tevahiya cîhanê re bûne mînak. Jinên ku di radiyoya Star FM de jî cih girtin, xwestin ku ew jî muhra xwe li dîrokê bixin, herwiha di Şoreşa Rojava de cih bigrin."

Lîlav balkişand ser destpêka avabûna Radiyoya Star FM û got, di radiyoya Star FM de destpêkê em tenê cend jin bûn, niha em nêzî 20 jinan ku bi hev re vî kar û xebatê birêve dibin, vê yekê guhertineke pir mezin di kesayeta me de da çêkirin, em dikarin bêjin ku di Star FM de me xwe, daxwaz, armanc û hêviyên xwe naskirin, herwiha em li ser wan armancan tevdigerin. Em jin Radiyoya Star FM wek qubleya azadiyê ji xwer dibînin. Di destpêkê de em di gelek zehmetiyan re derbas bûn, ji ber ku di nava civakê de ev tişt nûbû ku saziyek xweser bi taybet jin di warê raghandinêde cih bigerin. Lê bi demê re jinan bi xwe Star FM wek cihê ku bikaribin dengê xwe ji her kesî re raghênin, dîtin.




**Bandora bernameyên radiyoyê li civakê**

Lîlav da zanîn ku her bernameyek xwedî taybetmendiyeke cûda ye û wiha dewam kir: "Bernameyên radiyoyê yên siyasî bi tevlîbûna siyasetmedarên jin û bi şîrovekirina rewşa heyî ku civak têre derbas dibe, tê pêşkêşkirin, herwiha bernameyên hunerî ku hunermendên jin bi deng û awazê xwe tevlî dibin, tên weşandin. Bernameyên leşkerî bi şervanên YPJ` ê re tên çêkirin, bernameyên li ser şehîdên ku ji bo civakê canê xwe feda dane û …hw, tên dayîn. Ji aliya guhdarbûnê ve di bernameyên zindî û civakî de em dibînin ku gelek kes tevlî dibin û guhdar dikin. Ji ber ku radiyo amûra herî hêsane ku mirov li her derî bixwazî be lê guhdar bike, guhdar dike."

**'Em ê xewin û xeyalên şehîdan pêk bînin'**

Rêvebera radiyoya Star FM Lîlav Hesen dawî li axaftinê xwe anî û wiha got: "Em bi her şehîdekî re soza xwe nû dikin, di şexsê şehîd Denîz Ferat de û hemû şehîdên jin yên ragihandina azad, wan bi rêzdarî bi bîr tînin û soza xwe bi wan re nû dikin. Em ê wek rojnemevanên jin, li ser şop û armanca şehîdên çapemeniya azad,ji bo azadkirina tevahiya kurdistanê, ragehandina dengê heqîqetê, pêkanîna xewin û xeyalên şehîdan, em ê bi pênûs û kamîreya xwe têkoşînê bilindtir bikin û ji tevahiya êrîşên dijmin re bibin bersiv."

# Jin bi keda xwe jiyanê ji nû ve diafirîne

**Jinên Gundê Til Necma yê girêdayî bajarê Til Temirê teqez kirin ku jiyana herî xweş ya gundan e, ji ber jiyana herî nêzî jiyana civaka xwezayî li gundan e.**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê wekî gelek deran pirsgirêka aborî heye, lê jinên gundan bi keda xwe dibin bersiv ji krîzê re. Jiyana gund jiyana herî nêzî civaka xwezayî ye. Di gundan de jin jiyanê diefirîne, gihayên xwezayî berhev dike, pez xwedî dike, nanê tenûrê çêdike. Di nava baxçeyên xwe de amedekariya zivistanê dikin. Jinên gundê Til Necma yê girêdayî bajarê Til Temirê ya kantona Hesekê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, diyar kirin ku ji bo kirîza aborî û zindîkirina çanda dayîkê ew dibin bersiv.

Gundê Til Necma 10 km. li Rojhilatê Bajarê Til Temir dikeve, nêzî 80 mal ji pêkhateyên Ereb û maleke Kurd tê de dijîn. Gundî debara xwe bi kedîkirina pez, lawir, mirîşk, çandiniyê, çêkirina nanê tenûrê, dikin. Her roj sibehê gundî bi bêhna nanê tenûrê çavên xwe ji xewê vedikin, sûdê ji şîrê sewalên ku xwedî dikin digrin û mast û penîr çêdikin. Berhemên bexçeyên xwe diçinin û xwarina mala xwe çêdikin, amadekariya zivistanê dikin. Jinên Kurd pincar û giyayan berhev dikin û ji bo dermanê nexweşiyan di mala xwe de bikartînin.

**'Jin ji gihayên xwezayî dermanxaneyekî çêdikin'**



Bêrîvan Îsmaîl yek ji jinên Kurd e li gund dijî, da zanîn ku çanda komkirina gihayê xwezayî ji dayika xwe fêr bûye û wiha anî ziman: "Em tenê malbateke Kurd li vî gundî dijîn, hemû pêkhateyên Ereb in lê em bi hev re dijîn û dibin alîkar. Dayika min her dem gihayê xwezayî dida hev da ku me ji nexweşiyan biparêze. Ez jî jê fêr bûm û gihayê xwezayî didim hev. Gihayê ku niha didim hev yek jê gula hîro ye ev gul ji bo îltihaba sîng derman e bi taybetî di zivistanê de her kes bi sermayê dikeve ev gul ji bo wan tê bikaranîn. Heshesûk jî ji bo nexweşiya îshalê tê bikaranîn, salên dawî gelek kes bi vê nexweşiyê dikevin ji ber germahiya zêde û ava qirêj, ji bo wê ev dibe dermanê wê nexweşiyê. Gihayê qirincok di nava zeviyan de çêdibe ev giha em lê digerin û kom dikin. Ji ber ku ew derman ji nexweşiya remil a ku di gurçikan de çêdibe re baş e. Gelek giha hene her yek jî ji bo nexweşiyê derman e. Tiba xwezayî zanebûn jê re pêwîst e ev zanebûn jî li gel jinan bi pêş dikeve. Eger îro em binêrin em ê bibînin ku yên giha berhev dikin û di malên xwe de dihêlin, dermanxaneyek di mala xwe de çêdikin jin in."

**'Em ê dîroka civaka xwezayî zindî bikin'**

Bêrîvan Îsmaîl da zanîn ku di dîroka civaka xwezayî de ji bo keşifkirina tiba xwezayî gelek jinan jiyana xwe ji dest dane û wiha axaftina xwe domand:"Eger em vegerin dîroka civaka xwezayî em ê bibînin ku jinên xwedawend, bijîşk bûn. Jinan ji bo ku civaka xwe ji nexweşiyan biparêzin giha li ser xwe diceribandin, gelek ji wan bi vî rengî jiyana xwe ji dest dan. Jiyana xwe feda kirin da ku civaka wan saxlem dûrî nexweşiyan be. Bi vî rengî jinan tiba xwezayî keşif kirin û roj bi roj pêşxistin. Li hemberî pişaftina çanda tiba xwezayî gelek jinan heyanî roja îro jî ew çand parastin û hîn jî diparêzin. Her çiqas teknîk pêş bikeve û derman zêde bibe nabe wekî dermanê tiba xwezayî, ji ber ev derman tu bandora wî li ser mirovan tune ye. Em ê dîroka civaka xwezayî zindî bikin."

**'Em hewil didin bi derfetên destê xwe de debara jiyanê bikin'**

Asiya El-Etwa bal kişand ser krîza aborî ya ku niha li tevahî Rojhilata Navîn heye û got: "Jiyana gundan zû bi zû bandora krîzan lê nake, ji ber ku ev jiyan dûrî zext û siyasetên desthilatdariyê ye. Ev jiyan bi keda jinan tê avakirin. Min bexçeyê sebzeyan çandiye û têde bacan, bamî, xiyar, bacanê reş, îsot û xirtik hene. Bi vî baxçeyî em debara xwe dikin. Xwarina me ya rojane ji vî baxçeyî derdikeve. Niha jî ji bo zivistanê em amedekariya çêkirina ava bacanan dikin. Herweha em ava bacanan û bamiyan dixin nava hev û di qetremîzan de hiltînin û îsot û xiyarê kezdandî çêdikin. Her çiqas krîza aborî xurt be jî, bi vî rengê em ê bikaribin hinek debara malbata xwe bikin. Niha jiyana bajaran zehmet e, ji ber ku ew her tiştê xwe dikrin û pir buha ye, lewma yên ku herî zêde bandor li wan dibe kesên ku li bajêr dijîn e."

**'Qutkirina ava Xabûrê bandorê li ser çandiniyê dike'**

Asya di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Em nikarin ji bo firotinê baxçeyan çêkin, ji ber ku av tune ye. Xabûr ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatiye qutkirin ji ber wê jî em nikarin baxçeyekî mezin çêbikin. Her malek ji bo mala xwe kêmek zebze çandine û bîr kolane, ew bîr jî ava wê her ku diçe kêmtir dibe. Beriya niha Xabûr hebû, Hesekê û Til Temir jî bi şînahiya xwe dihat naskirin, lê mixabin niha av hatiye qutkirin û çem ziwabûye. Em bang li rêxistinên mirovî dikin ku ji bo çemê Xabûrê çareseriyekî bibînin û bi çavekî mirovî li rewşa welatiyên hesekê binêrin û li hemberî dewleta tirk a qirker û faşist rawestin.

**Ramangeh**

## ROJA RÛMETÊ; 15'Ê TEBAXÊ

**Zozan CIZÎRÎ**

Şerê Ehrîman û Ahûra Mazdayan bi hemû dijwariya xwe didome di van rojên em şahiyên serkeftinê li ser axên Dayîka Xwedawend pîroz dikin. 39 salên dûr û dirêj ku tijî berxwedan û serkeftin. Ji guleya destpêkê ya li nav dilê Ehrîmanan hat xistin, dîroka gelekî ku rastî sedan komkujî û koçberiyan hatî, jinûve bi vejîna serhildan û azadiyê hat nivîsandin. Ruhê vejînê êdî bûye çandek, bûye nirx û rûmeta civakî. Lewre her roj destanên nû yên lehengiyê tên nivîsîn li çiyayên Ahûra Mazdayan. Her destanek Ehrîmanekî hildiweşîne li ser van axên ku 5 hezar sal in bi hesret û hêviya azadiyê her di nav têkoşîn û berxwedanê de ne.

Eger em ê bi çavê jin li vê pêvajoya dirêj a 39 salan binêrin û binirxînin; elbet destpêkê jin cara yekê bi saya vê têkoşînê bû xwediyê hêza xweparastinê, bû xwedî îrade. Ji dîrokê heya roja îro di nav gelek şoreşên sosyalîst û têkoşînên rizgariya neteweyî de jinan tim wek leşker û milîtan cihê xwe girtine, lê rexmê ked û berdêlên giran jî, nekarîne bibin xwediyê rêxistinekê ku nasnameya xwe ya jin temsîl bikin. Îro jî li çar aliyên cîhanê rexmê jin di nav artêşan de cih digirin, hemû erk û rayeyên wan ên leşkerî di bin venêrîn û erêkirina zilam de ye. Hemû biryarên der barê wan de, vesazî, raye-rûtbe, sewq-îdareyên wan, wê tevlî şer bibin an nebin û wekî van her cureyê biryarê ji aliyê zilam ve tên destnîşankirin. Di vî alî de statuya jin a nav malê û cihê wê yê nav civakê, di nav artêşê de jî bi awayek cuda berdewam dike. Encex di vê şoreşa nûjen û hemdem de li ser esasê felsefeya "jina azad welatê azad e" yekem car di meydana cengê de cihê jin, hêza jin a fikrî, keda jin, sekin û lehengiya jin, şerkerî û zîrekiya jin a di xeta parastina rewa de evqas şênber û watedar dibe. Ev hêza rêxistinî û îradî ya jinan bi dest xistî, bûye temînata serkeftina Şoreşa Gelan. Di dîrokê de Hugo Grotîus sala 1925'ê pirtûka bi navê "De Jure Bellî ac Pacîs" der barê têgînên şer û aştiyê de amade dike û ji ber raman û nirxandinên xwe yên der barê şer û aştiyê de Grotîus wekî sazkarê huqûqa navnetewî tê qebûlkirin. Grotîus, di pirtûka xwe de fikra ku "pêwîste sedemeke mafdar a şer hebe" parastiye, ji bo vê jî sê sedem pênase kirine. Yek ji vana, sedema parastina rewa ye. Têkildarî vê girîng e mirov destnîşan bike, îro di cîhanê de hêza ku ji bo hebûn û nasnameya xwe şerê parastina rewa dike HPG-YJA Star û hemû hêzên parastinê yên ji vê çavkaniyê welidîne. Û ger em ê behsa huqûqeke navneteweyî bikin, divê êdî tu kes û tu hêzeke berpirsiyar li hemberî van kîmyabaran û bombebaranên li ser gerîlayên azadiyê bêdeng nemîne. Berevajî, li hemberî van serkeftinên îro li çiyayên Kurdistanê di kesayeta şervanên azadiyê de li hemberî şerê der-exlaqî û ne-rewa yê dewleta Tirk a dagirker rabin silavê û ji bo dawî li van hovîtiyên çeteyên dewleta Tirk bînin helwesta mirovî ya pêwîst raber bikin. Helwesta şayanî huqûqa navnetewî encex ev be.



# Pirtûkxaneya Amara cihê pêşxistina xwendinê ye

Pirtûkxaneya Amara a li bajarê Qamişlo, bi şoreşa 19`ê Tîrmehê re, bûye cihê hezkirin, xwendinê û gotûbêjên rewşenbîr û nivîskaran. Di pirtûkxaneyê de nêzî 5 hezar pirtûk hene, beşek jê berhemên nivîskarên Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê ne û beşê din jî, ji derveyî heremê hatine peydakirin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Pirtûkxaneya Amara ku di sala 2018'an de hat vekirin. Weke ku tê zanîn qada wêjeyê yek ji qadên herî diyar ên şoreşa Rojava ye, bi destpêkirina şoreşê re. Çalakiyên wêjeyê pêş ketin û li gorî vê yekê liv û tevgereke wêjeyî û rewşenbîrî bê navber berdewamkir. Gelek nivîskarên ku derfeta çapkirin û belavkirina nivîs û berhemên xwe yên wêjeyî nebûn, xwe di saziyên pêwendîdar de, di vî warî de birêxistin kirin, berhem û pirtûkên hêja pêşkêş kirin, di nivîsandina dîroka şoreşê de rol lîstin.

Di salên şoreşê de gelek çalakiyên wêjeyî hatin lidarxistin. Bi armanca pêşxistina çanda xwendinê, parastina zimanê dayikê û pêşxistina wêjeya kurdî, gelek weşanxane û pirtûkxane hatin vekirin. Di vê çarçoveyê de Selîm Ebas ji rojnameya me re axivî.

'Pirtûkxaneya Amara cihê zanistê ye '

Selîm Ebas axivî û got:" Pirtûkxaneya Amara di sala 2018`an di bin sîwana Komîteya wêjeyê ya Rojava de hat vekirin, tê de 5 hezar pirtûkên curbicur hene, ji aliyê nivîskarên bakur û rojhilatê Sûriyê û deverên din wekî Şam, Misr, Lubnan, bakur û başur jî di pirtûkxaneyê de hene. Di pirtûkxaneyê de pirtûkên ku bi zaravayên cuda yên zimanê Kurdî Erebî, Îngilîzî, Soranî û Tirkî jî hatine nivîsandin hene. Ew ne tenê cihê xwendin û lêkolînê ye, weke din jî pirtûkxane bûye cihê gotûbêj, şîrove û nirxandinên ku di derbarê ziman û wêjeyê de têne meşandin.

Pêşxistina çanda xwendinê

Selîm Ebas diyar kir ku armanca wan a sereke pêşxistina çanda xwendinê ye û wiha dewam kir û got:" Em hewl didin çanda xwendinê di civakê de bi taybet di nava ciwanan de pêş bixin. Gelek xwendekar, ciwan û kesên bi temen mezein ku bi xwestek tên pirtûkxaneya Amara û pirtûkan dixuînin hene. Her wiha beriya şoreşê, her kes bi tirs nêzî zinanê xwe yê dayikê dibû û bi rengekekî dizî dihat xwendin. Lê piştî şoreşa rojava êdî pirtûkên kurdî belav bûn, pirtûkxaneyên kurdî, dibistanên kurdî, zanîngihên kurdî hatin vekirin. Herwiha gelek kesayetên biyanî pirtûk li ser şoreşa rojava û li ser kurdan nivîsandin e, û bi gelek zimanan hatine wergerandin û belavkirin. Ji ber şoreşa Rojava bandora xwe li ser cîhanê tevahî kiriye, ev yek bi serê xwe serkeftin û destkeftiya herî mezin a şoreşa Rojava ye."

Selîm di berdewamiya axaftina xwe de, da zanîn ku Pirtûkxane ji holeke fireh pêk tê û ji hemû milî ve em hewil didin ku rehetiyê ji xwendevan û mêvanan re peyda bikin û got:" Di pirtûkxaneyê de roman, çîrok, ferheng, pirtûkên olî û çandî û pirtûkên zarokan bi Erebî û Kurdî peyda dibin.



Her wiha Pirtûkxane di warê piştgirî û teşwîqkirina xwendinê de xwedî girîngiyeke taybete û pirtûkxane ger ku çiqas kêmahiyên xwe hebe jî, lê cihê yekem e, ku derfet ji bona xwendinê têde hatine avakirin. Hemû dildarên xwendinê dikarin biçin pirtûkxaneyê û pirtûkên ku dixwazin bixwînin. Li şûna ku bi bihayên giran pirtûkan bikrin û bixwînin, li pirtûkxaneya Amara bi bihayê erzan dikarin bikrin û li pirtûkxaneyê jî dikarin bixwînin. Ji ber ku gelek kes rewşa wan a madî zehmete û nikarin pirtûkan bikirin. Li ser vî bingehî pirojeya vekirina pirtûkxaneyeke, ku bala gelek xwendevanan bikişîne û aramî û atmosferek guncaw ji bo xwendinê ji wan re peyda bike.

Selîm Ebas di dawiya axaftina xwe de wiha got:" Me ev pirtûkxane ji bona, nivîskar, xwendevan, rewşenbîr û çi kesê ku dixwaze bixwîne û asta xwe ya zanistê pêşbêxe vekiriye. Hêjayî gotinê ye ku çand şertê bingehîn û pêwîst yê avakirina civakeke ramyarî, sinc û dabînkirina wekheviya civakî û çespandina nirxan. Ofîs û malên çandê ji bona ku her cure hêzê didin geşepêdan û pêşketina mirovatiyê hatine vekirin. Armanca me ji vekirin û amedekirina sazî û navendên lêhûrbûnê, zêdekirina hejmara xwendevanên zimanê kurdî û hebûna dibistan, sazî, peymangeh û zanîngehên bi zimanê kurdî û xurt kirin û berfirehkirina vê xebatê. Hewildanê me yê sereke ew e, ku em dixwazin pirtûkxane ye Amara bibe referansa van hemû saziyên kurdî."

# Pêşengê helbesta nûjen a Kurmancî

**NAVENDA NÛÇEYAN**

**Helbestkar û nivîskar Qedrî Can ku weke pêşengê helbesta nûjen a Kurmancî jî tê zanîn, yek ji wan nivîskaran e ku binxet bûye. Qedrî Can li gel nivîskariyê di warê siyasî de jî ji bo welatê xwe ji serdestan xelas bike dikeve nav hewladanan. Axir ew jî weke gelek nivîskarên Kurd bi hesreta welatekî azad serî datîne.**

Qedrî Can an jî Qedrî Can helbestvan û nivîskarekî Kurd bû. Ew bi navê Abdulqadir Can li Dêrika Çiyayê Mazî (Mêrdîn) di sala 1911'ê da hate cîhanê. Di piçûkahiya xwe de Qedrîcan wek Qedrî dihat naskirin. Ji zarokahiya xwe de Qedrî Can pir xwedî şans bû ji ber bavê wî (ku bi kurtahî wek Cano tê naskirin) qedr dida xwendinê û kurê şand xwendinê. Di dibistanê de ew xwendevanekî pir pêşketî û baş bû, bi taybetî di mijara hejmaran da (matematîk). Piştî dibistana destpêkê, dibistana navîn û bilind Cano kurê xwe şand Zanîstana Mamosteyan a Konyayê.

Di wan salan de Qedrî Can welatparêziya xwe hîn xurtir kir û navê xwe xist lîsteya dewleta Tirkan ya reş. Ji bo Qedrî Can tenê du çare ma bûn; mirin an jî rev. Qedrî Can ji dewleta Tirk, bi riya Antakyayê, reviya çû Rojava. Piştî revînê, ew nema dikaribû vegere welatê xwe, cihê xwe yê



zayînê Dêrika Çiyayê Mazî. Bavê xwe Cano, ku pir girêdayî hev bubûn, nema didît.

**Gulasor bêhin da dor**

Qedrî Can yek ji helbestvanên herî mezin ên gelê Kurd bû û wek bavê helbesta nûjen a Kurdî (helbesta torê ya nû) tê naskirin. Wî bi nivîsoka xwe di zaraveya Kurdî ya Kurmancî de dinivîsand. Yek ji helbestên wî ya herî bi nav û deng Gula Sor bi destê hozanê navdar Ciwan Haco hat bestekirin. Lê Qedrî Can ne tenê helbestvan bû, helbestvanî tenê yek ji xebatên wî yên pirhejmarî bû. Ew mîna rewşenbîr, ronakbîr, zana, helbestvan, wergervan û polîtîkvanekî dihat naskirin. Qedrî Can li hember qedexe û zoriyên dewleta Sûriyê dersên Kurdî dida xwendevanên xwe yên dibistanê.

**Qedrî Can helbestvan û rewşenbîr bû**

Dema ku mirov li rûpelên rojname yan kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû binêre, xebatên Qedrî Can tên dîtin. Dema ku li Konyaye dixwend pir nakokî di nav mêjiyê wî de çêdibin. Jiyaneke bi xirecir li ber çavên wî ket. Xwest ku xwe binase, li binyada xwe, çand û dîroka xwe vekole. Kete nav lêkolîn û lêgerînên dû dirêj. Dema ku di betlaneya havînê de dihate gund, gelek xort li dora xwe vedihewandin. Ji wan re qala azadiyê û welêt dikir. Keça Qedrî Can, Şêrîn Can ku li Sûriyê bijîşkiyê dikir ji bo bavê xwe dibêje: "Dema ku havînê ew dihate Dêrikê xort didan dûv xwe û li nav rezan diciviyan. Kêlik diçikandin û berik bera wê didan."

**Bi bêrîkirina welat çû**

Dema ku dewlet bi xesletê Qedrî Can dihese dikeve pey şopa wî. Qedrî Can dinêre ku tevgera Şêx Seîd têk çûye. Çi rewşenbîr û welatparêz hene an têne girtin an jî kuştin. Ew jî dev ji dibistanê berdide, tevî Reşoyê Dêrikî û çend hevalên din biryar didin ku binxet bibin. Li nêzî tixûb Qedrî Can û bavê xwe hev û dû dibînin. Qedrî Can rewşê dibêje û ji bavê xwe re dibêje ku ew dê rojekê welêt rizgar bikin wê çaxê welat dê pir xweş be û ew jî dê vegerin. Bavê wî nikare wî ji bo ku neçe îqna bike. Qedrî Can berê xwe dide Şamê û di nav bilbilên Şadî yên ku her tim li dûrî gulistanê dixwînin û keserkûr in de cih digre. Beriya ku wefat bike, gelek name ji lêzimên xwe re şandine. Gotiye min pir bêriya welêt kiriye û ez dê rojekê vegerim. Lê mixabin ev xwesteka wî bi cih nehatiye. Qedrî Can di sala 1972'an de jiyana xwe ji dest dide.

Va ye nimûneyek ji wan helbestên Qedrî Can a helbesta nûjen a Kurmancî. Wî ev helbesta bi navê "Begê Axir" di sala 1942'an de li Şamê nivîsandiye. Ji ber helbest pir dirêje, em tenê beşek jê parve dikin.

Begê axir

Dostê min:
Dijminê postê min..
Begê axir zeman...
Ew zenbîla tu pê hat,
Nema datê ji ezman.
Benê wê riziya
Li nava rê qetiya,
Ew ket..
Ket nava derya sor,
Derya sor jê ra bû gor,
Derya sor
Ji Fer`ewn û çend xwedê biçûk ra
Bû kefen...
* * *
Meznatî,
Ne bi pare û mal e...
Ne bi gorina kal e...
Meznatî,
Bi cewherê insan e !
Bi `ilm û `irfan e !
Belê... em xizanê mal in,
Lê zengînê kemal in...
Zengînê îdeal in...
Dostê min
Dijminê postê min,
Begê axir zeman
Ew zenbîla tu pê hatî,
Ne ma datê ji ezman
* * *
Bablîska bîstan,
Dîroka rastan,
Dibêje:
Bibêje...
Guh mede efsaneyên dêwan
Bi şûnda ne mîne ji karwan
Karwanê medeniyet,
Gurûhê beşeriyet....
Xulase;
Pêşî û paşiya felsefe..
Felsefeya me
Ev e:
Dîn.. mezheb.. îman..
Bibe însan ! bibe însan !
Dostê min
Dijminê postê min,
Begê axir zeman
Ew zenbîla tu pê hatî,
Ne ma datê ji ezman

# Pirojeya Heyva Sor A Kurd a kolandina bîrên avê li Şehbayê dest pê kir

Li herêma Şehbayê kêmbûna avê bûye pirsgirêkeke giştî, ji ber tunebûna sotemeniyê rêjeya derxistina avê jî kêm bûye. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kêmbûna avê, Heyva Sor A Kurd li herêma Şehbayê dest bi pirojeya kolandina bîran û avakirina sitasyona derxistina avê kirin e.

**Zana Roj/ Şehba**

Weke ku tê zanîn piraniya welatiyên li Şehbayê , xelkê Efrînê ne ku piştî dagirkirina herêma Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ve, bi darê zorê ji mal û warê xwe derketine û xwe li herêma Şehbayê bicih kirine. Her wiha hemwelatiyên herêmê yên resen jî hene. Herêma Şehbayê weke cografî rastî gelek êrîşên komên çeteyan, DAÎŞ û artêşa Sûriyê hatiye. Herî dawî ji aliyê şervanên azadiyê YPG û YPJ ê ve hat rizgarkirin. Ev êrîşên li ser herêma Şehbayê hatine kirin, yekser bandora xwe li ser sererd û binerda herêmê kir, lewra ji ber sedemên cur be cur yên weke guhartina hawayê û êrîşên hatine rûdan, ava vexwarinê êdî ber bi zûhabûnê ve diçe.

Ji aliyekî din ve, dorpîça hikumeta Şamê bi hemû rengê xwe didome. Tunebûna madeyên sotemeniyê yekser bandora xwe li ser derxistina avê kiriye. Ji ber wê jî Heyva Sor a Kurd dest bi pirojeyên kolandina bîran û avakirina sitasyonên derxistina avê kirin e.

Têkildarî kêmbûna avê li herêmê û bandora dorpêça hikumeta Şamê, her wiha pirojeyên ku ji aliyê Heyva Sor a Kurd ve hatine destpêkirin, hevserokê Komîteya Avê ya Navendî Seydo Seydo û endamê Heyva Sor Heyder Reşîd ji rojnameya me re axivîn.



Seydo Seydo

### Kêmbûna rêjeya avê li herêmê

Seydo destpêkê diyar kir ku bi hatina demsala havînê re rêjeya avê bi awayekî berbiçav kêm bû û wiha got: “Bi hatina demsala havînê û bilindbûna pileya germahiyê re, gelek bandor li rewşa avhewayê û rêjeya ava vexwarinê ya bîran bû, herwiha di aliyê çandiniyê de jî, zevî û sebzeyên ku hatine çandin ji ber germahiyê û rewşa hawayê piraniya wan hişk bûn. Bi taybet di aliyêpeydakirina avê de zehmetiyê mezin tên dîtin. Bîrên di destê me de ber bi zûhabûnê ve diçin û rêjeya avê bi giştî kêm dibe.”



Heyder Reşîd

### Dorpêça Hikumeta Şamê û zehmetiyên jiyanî

Seydo anî ziman ku dorpêça ferzkirî ya Hikumeta Şamê rola herî mezin di kişandina pirsgirêka avê de dilîze û wiha domand: “Ji ber dorpêça ku zêdetirî 2 sala ye bi awayekî giran li ser herêmê hatiye ferzkirin, bê guman piraniya pirsgirêkên ku di giştî herêmê de tên qewmandin jêdara xwe ji wê digire. Hikumeta Şamê ya ku nahêle madeya sotemendiyê derbasî herêmê bibe, rê li ber zehmetiyên jiyanî vedike. Em tavahî dizanin heyanî ku av ji bîran bê derxistin pêwîstî bi cenetor û mazotê heye. Lê ji ber mazot bi giştî kêm e em mecbûr mane ku bîran rawestînin”.

“Rêxistina US 2 hezar mitire kab ji avê derbasî herêmê dikir, lê ew jî hat kêm kirin”, bi van gotinan Seydo anî ziman ku Rêxiatina US ya navnetewî ji 2 hezar mitir kab ji ava ku derbasî herêmê dikir, rêjeya wê daxistiye 1 hezarî. Ev jî kirîza kêmbûna avê zêdetir kiriye.

### Pirojeyên Heyva Sor A Kurd

Endamê Heyva Sor A Kurd Heyder Reşîd da zanîn ku wan ji bo çareserkirina kirîza avê li giştî herêmê dest bi pirojeya kolandina bîran kirine û wiha got: “Ev piroje ji aliyê Heyva Sor A Kurd di 24 Tîmehê de hatiye destpêkirin. Girîngiya wê ku ji kirîza kêmbûna avê li herêmê re bibe çareserî, bi taybet di hundirê kampan de bîr nînin û rêxistinên têkildar rêjeya avê kêm kirine, lewra niha me ji kampa Serdemê dest pê kiriye, her wiha wê li kampa Berxwedan û navçeya Ehdas ev piroje wê pêş bikevin.”

### Li hember tunebûna sotameniyê altirnatîva enerjiya rojê

Heyder anî ziman ku ev poirojeya enerjiya rojê li şûna sotemeniyê esas digire û wiha domand: “Li hemberî dorpêça Hikumeta Şamê a ku nahêle sotemenî û madeyên bingehîn yên jiyanî derbasî herêmê bibin, weke altirnatîv li şûna sotemeniyê, me derxistina avê bi enerjiya rojê di van pirojeyan de esas girtiye. Bi taybet di hundir kampan de li cihê ku bîr bên kolandin, wê ev altirnatîv bên çêkirin da ku tavahî gel ji avê sûdê werbigire”.

### ‘Ji bo alîkariya gel çi ji destê me bê em ê bikin’ ‘’

Heyder di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku di van pirojeyan de şeredarî û rêxistinên biyanî bûne destek û wiha got: “Ev pirojeyên hatine destpêkirin bê guman ji bo çareserkirina pirsgirêkên tên jiyankirin, ji bo derbaskirina van zehmetiyan çi ji destê me bê derketin em bê teredud dikin. Li ser vê bingehê şeredariya gel ya herêmê bi me re dibe alîkar, her wiha Rêxistina Midico entarnashonal ya Siwêsrî dibe alîgir”.

# Zanist û çanda civakê bi riya perwerdeyê pêş dikeve

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Hevserokê Desteya Perwedeyê Mustefa Ferhan diyar kir ku bi avabûna Peymangehan re rêjeyeke baş ji mamosteyan derçûn. Her wiha Akademî jî asta mamosteyan li pêşdixe û guhertina ku bi riya biranş û beşan pêk tê, di akademiyan de mamoste jê sûdê werdigrin .**

Bi şoreşa Rojava re gelek destkeftiyên mezin hatin bi destxistin. Yek ji wan destkeftiyan ew bû ku gel nikarîbû nav û warê xwe bi kurdî bîne ziman û binvîse. Di dibistanan de bi fermî dest bi zimanê dayikê hate kirin û herwiha Zanîngeh û Peymangeh jî hatin avakirin. Li kêleka wê jî Akadimiyên girtî ku tê de mamoste, bi armanca xutkirina ziman dest bi kar û xebatan hate kirin.

Derbarê avakirina Peymangeh û Akadimiyan de, Hevserokê Desteya Perwedeyê ya herêma Cizîrê Mustefa Ferhan ji rojnama me re axifî.



### ‘Di peymangehan de mamoste têne perwerdekirin’

Mustefa Ferhan diyar kir ku ji Refa 1`ê de perwerde hat destpêkirin û wiha got: “ Dibistanên Zimanê kurdî ji refa yekê ve hat destpêkirin. Dema ku şagirtên refa 12`an sala xwe ya xwendinê bi dawî kirin, piştî wê derbasî Zanîngeha Rojava dibin. Herwiha ji ber hijmareke zêde ya xwendekarên Zanîngehê nema dikarîbûn hemû xwendekaran derbasî Zanîngehê bikin, Ji bona vê yekê Peymangeh hatin avakirin. Xwendekarên ku pileya wan kêm bû derbasî Peymangehan dibin. Armanca paymangehan perwerdekirina mamosteyan e. Di peymangehê de tavahî beşên biranşan hene, mîna Bîrkarî, Zanyarî, Fîzîk, Kîmiya, Werzîş, Wêne û Mûzîk hatine vekirin. Herwiha li herêma Cizîrê du peymangeh hene, yek li bajarê Qamişlo ye ku 415 xwendekar lê hene, yan din jî li bajarê Hesekê ye û 317 xwendekar lê hene.”

### ‘Akademî asta Mamosteyan xurt dike’

Mustefa wiha axftina xwe berdewam kir û got: Ji xwe li gorî sîstema ku em li ser kar dikin xwendekarên ku peymangehê bi dawî bikin wê bibin mamoste û got: “Xwendekarên ku îsal peymangehê bi dawî bikin, tevlî dibistanan dibin û wê waneyan jî bidin . Herwiha Akademiyên ku ji kevin de vekirî jî hene. Akadimî tenê dibin alîkar ji bo asta mamosteyan bilind bikin. Xwendekar derbasî Peymangehan dibin û têde perwerdeya xwe dibînin. Mamoste jî derbasî Akademiyê dibin û perwerdeya xwe têde dibînin û asta wan tê xurt kirin.

Ji xwe avakirina beşek ji Akademiyan di sala 2015’an hate vekirin. Sîstema Akademiyan girtî ye û tê de mamoste perwerdeya bîrdozî û biranşan dibînin. Di salê de nêzî 2-3 dewreyên biranşan ku nêzî 45 xwendekar derdiçin têne vekirin.




Akademiyên xweser yên girêdayî jinê jî, ku sîstema kar û xebata jinê di aliyê Rêveberî û Fikirî de tê dayîn jî hene û ew bi zimanê Erebî û kurdî ne û hejmara wan jî 5 akademîne”

### ‘Astengiyan di dîtina mamosteyên biranş de dibînin’


Hevserokê Desteya Perwerdeyê Mustefa Ferhan axftina xwe wiha qedand:”Ji ber mûçeyên kêm em gelek zehmetiyan dibînin hatnanî ku karibin mamosteyên biranşan peyda dikin. Herwiha dema tên peyda kirin jî li gorî demê kar dikin, di vir de jî mamosteyên biranşan ji mûçeyên xwe nerazîne, beşek jî ji mamosteyan bi fedekarî bi me re kar dikin, herwiha astengiyên Akademiyan jî ji ber girtina rêjeyek mezin ji mûçeyan jêre divê. Armanca ku perwede di demsala havînê de tên kirin ji ber sal bi sal guhertin tên kirin. Di vir de em wek Desteya Perwedê neçar dibin, ku li gorî van guhertina jî mamosteyên xwe avabikin. Sal bi sal dewreyên perwerdeyê ji mamosteyan re têne meşandin. Di vê salê de mamoste li ser 4 xalan wê bêne perwerdekirin. Perwerdeyên heyî jî girêdayî mijarên bîrdozî, Sinc, Felsefe û rêbaza fêrkirin û bi ci rengî xwendekarên xwe perwerde kirin û dabeşkirina kar û xebatê heyî li gorî vê yekê.



# ‘Azadiya Rêber Abdullah Ocalan azadiya hemû mirovan e’

Bi bêdengiya sazî û çapemeniya Ewropayê , tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan berdewam e, akademisyanê Îtalî Federico Venturini diyar kir ku azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan têkoşîna azadî û rûmetê ya hemû mirovan e.

Ev 29 meh in, ji Rêber Abdullah Ocalan ku li Girtîgeha Îmraliyê dîlgirtî ye, agahî nayên wergiritin. Parêzerên wî ji bo hevdîtinê hefteyê 2 caran serî li dozgeriyê didin, lê tu bersivekê nadinê. Akademîsyenê Îtalyan Federico Venturini yê alîgirê kampanyaya navneteweyî ya ‘Freedom for Abdullah Ocalan” (Ji Abdullah Ocalan re Azadî) der barê tecrîda giran a li ser Rêber Abdullah Ocalan, axivî.



### ‘Bêdengî şermeke mezin e’

Federico Venturini got: “Mixabin girtîbûna wî dibe mînakeke trajîk ku dewleta Tirk li hemû girtîgehên din pêk tîne û mafên bingehîn ên mirovan ên girtiyan înkar dike.” Venturini diyar kir ku êriş tevî bêdengiya sazî û dezgehên çapemeniyê yên Ewropayê de pêk hatine û destnîşan kir ku ev cihê şermê ye ku divê neyê qebûlkirin û got: “Ji bo azadiya Abdullah Ocalan divê her cure hewldan bê kirin.”

### ‘Hêzên ewropayê ji konfederalîzma demokratîk ditirsin’

Venturini got Rêber Ocalan bingehên konfederalîzma demokratîk bi awayekî serkeftî danîne û teorîsyenekî jêhatî ye û li ser nêzîkatiyên dewletên Ewropayê yên li hemberî Rêber Abdullah Ocalan wiha got: “Tevgera azadiyê ya Kurd vê paradîgmaya siyasî ya nû wek alternatîfeke şênber a modernîteya kapîtalîst bi pêş dixe û bi cih tîne. Hêzên Ewropayê ditirisin ku ev fikr berbelav bibin û îmtiyazên wan kêm bikin, lewma jî dê li hemberî mînakek wiha tehemul nekin. Her wiha haya dewleta Tirk jî jê heye ku dewlet û saziyên Ewropayê li dijî provokasyon û polîtîkayên wê yên ku mafên mirovan binpê dikin, dengê xwe nakin.”

### ‘Yekane rêya aştiyeke mayînde azadiya fîzîkî ye’

Venturini îşaret pê kir ku azadiya Rêber Abdullah Ocalan ji bo aştiyeke adil û mayînde ya li Rojhilata Navîn esas e û haya dewleta Tirk ji vê heye û wiha pê de çû: “Divê azadiya wî ya fîzîkî hebe da ku bikare bixwîne, bigere û dema hewce be hevdîtinan bike. Tirkiye bi bi girîngiya sembolîk a ragirtina Rêber Abdullah Ocalan di nava esaretê de, dizane. Ew rêberê navdar ê Tevgera Azadiyê ya Kurd e û kesayetek e ku gelê Kurd li gelemperiya cîhanê dike yek. Dewlet bi girtina wî mesajeke xurt dide ku yekane çareseriya pirsgirêka Kurd şîdet e. Piştî ku azadiya fîzîkî pêk bê, gelê Kurd dê bibe xwedî derfet ku di nava aştî û xweseriyê de bijî.”

### ‘Divê dilsoziya me ya bi azadiya wî re bidome’

Venturini pênaseya “çirayeke hêviyê” ji bo Rêber Abdullah Ocalan bi kar anî û got ji bo azadiya wî ya fîzîkî pêwîstî biryardariyeke xurttir heye û wiha dewam kir: “Pirsa divê çi were kirin, pirseke gelekî girîng e ku bi demê re deng vedide. Ne tenê meseleya xîretê ye, di heman demê de divê zext li dewleta Tirk bê kirin û alternatîfên ji bo diyalogê bi welatî û saziyên Ewropayê re çêbin. Rêber Abdullah Ocalan wek çirayeke hêviyê li ber me disekine. Divê em piştrast bin ku fikrên wî bi israr belav bikin û ji bo serbestberdana wî têkoşînê bidomînin. Wek ewropî em nikarin dev ji gelê Kurd berdin; divê dilsoziya me ya ji bo azadiya wî bidome.”

### ‘Têkoşîna rûmetê’

Federico Venturini wiha ê zêde kir: “Azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan ne tenê ji bo rizgariya gelê Kurd e, ji bo hemû mirovan têkoşîna azadî û rûmetê ye. Divê em paşguh nekin ku rola wî ji çarçoveya pirsgirêka Kurd gelekî wêdetir e. Prensîbên hevgirtin û azadiyê yên ji aliyê konfederalîzma demokratîk ve hatine destnîşankirin, di tevgerên civakî yên cîhanê de deng vedidin.”

### Federico venturini kî ye?

Federico Venturini bi Thomas Jeffrey Miley re edîtoriya pirtûka ‘Azadiya Te û ya Min: Rêber Abdullah Ocalan û li Tirkiyeya Erdogan Pirsgirêka Kurd’ kir. Sala 2016’an doktora xwe ya ekolojiya civakî, krîza bajarî û tevgerên civakî ji Zanîngeha Leedsê wergirt û bi salan di xebatên li ser azadiya Rêber Abdullah Ocalan de cih girt. Li Zanîngeha Udine ya Îtalyayê xebatên xwe yên akademîk didomîne. **ANHA**

# QSD: Divê hesab ji çeteyan bê pirsîn

**Navenda nûçeyan**

**QSD’ê, cezayên DYA’yê yên li komên çete erênî nirxandin û banga bidawîkirina dagirkeriya Tirk a li herêmê û hesabpirsîna ji sûcdaran kir.**

قوات سوريا الديمقراطية
Hêzên Sûriya Demokratîk

Daxuyaniya Navenda Ragihandinê yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) wiha ye:

‘Em biryara DYA’yê ya birîna cezayan li komên terorîst ên Hemzaet û Emşat û şîfên wan erênî dibînin. Em di wê baweriyê de ne ku saziyên Amerîkayê dikarin awayên şopandin û cezakirina van koman pêş bixe.

Rapora dawîn a Wezareta Xezîneyê ya Amerîkayê careke din asta kiryarên hovane eşkere dike ku rêxistinên terorîst ên girêdayî dewleta Tirk a dagirker li herêmên dagirkirî yên bakurê Sûriyeyê, bi taybet li Efrîna dagirkirî pêk tînin.

Kiryarên terorî ku li dijî niştecihên resen têne kirine ne kiryarên ferdî ne, lê belê kiryarên sîstematîk û stratejîk in ku bi fermanên dewleta Tirk a dagirker têne kirin. Aliyê sereke yê ku destê wê di van kiriyaran de heye, Tirkiyeyê ye. Tirkiye ev herêm dagir kirine û kirine cihekî ewle ji rêxistinên terorîst ên sûcdar re ku DAIŞ’ê jî di nav de ye. Dewleta Tirk a dagirker bi tevahî rê û rêbazan desekê dide van koman da ku planên guhertina demgorafîk, koçberiya bi darê zorê, revandin, destdirêjî, talankirin û wêrankirinê pêk bînin. Dewleta Tirk a dagirker hewl dide hawirdoreke qanûnî ya navneteweyî peyda bike da ku wan kiryarên terorî binixumîne. Em bang li tevahî rêxistinên navneteweyî yên têkildar dikin ku dagirkeriya Tirk bi dawî bike û hesab ji sûcdaran bipirse.”

# Îran bi ketina sala yekem a serhildanê, zextan zêde dike

**Navenda nûçeyan**

**Bi nêzîkbûna salvegera qetilkirina Jîna Emînî, li Îranê ku agirê serhildanê nayê vemirandin, gelek jinên têkoşer hatin girtin. Hate hînbûn ku sewqiyata leşkerî ber bi bajarên Kurdistan û Belûcîstanê ve hatiye kirin .**

Dewleta Îranê bi nêzîkbûna 16’ê Îlonê salvegera qetilkirina Jîna Emînî re zextên xwe hîn zêdetir kir.

Piştî qetilkirina Jîna Mahsa Emînî, serhildana “Jin jiyan azadî” li welat dest pê kir û dengê jinan li hemû cîhanê deng veda. Di xwepêşandanan de piraniya wan zarok bi sedan kes hatin qetilkirin; bi hezaran kes birîndar bûn. Dewleta Îranê ji bo ku desthilatdariya xwe biparêze dîsa bi deh hezaran kes girtin.

Hate hînbûn ku li Îranê di nava hefteyekê de herî kêm 70 jinên aktîvîst hatin binçavkirin. Hejmara kesên ku hatine binçavkirin nayê zanîn, endamên malbatê



yên ku di çalakiyan de zarokên xwe winda kirine hatine girtin.

Navê hin jinên ku hatine girtin wiha ne: “Azade Chavoşian, Faough Sami Nia, Jaluh Javaheri, Yasmin Hashdari, Zahra Daders, Matin Yezdani, Shiwa Shah Siyah, Nagin Rezaee, Wahdeh Khosh Sirt, Sara Chani, Homan Taheri, Newsha Badie Sabet.

### Sewqiyata leşkerî didome

Li aliyê din hate gotin ku leşker şandine bajarên Kurdistan û Belûcîstanê ku serhildana “Jin jiyan azadî” lê dijwar bûye. Li gor agahiyên hatiye bi dest xistin Di hefteya dawî de li bajarên Seqiz, Îlam, Mehabad, Kirmanşan, Sine, Dîwandere, Degulan, Makû, Urmiye, Sine, Merîwan, Şino û Kerec, Tebrîz, Meşhed, Kiş, Kirman, Yezd, Reşt, Bender Abbas, Abadan, Erdebîl, Tehran, Îsfehan, Kazwîn, Zîncan, Mazenderan û Hemedanê sewqiyata leşkerî ya dijwar hatiye kirin.

# ‘Beyannameya Rêveberiya Xweser bingeha çaresekirina kirîza Sûriyê ye’

Ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê bi 10’an civînên navneteweyî hatine li darxistin, lê ji ber berjewendiyên hêzên navneteweyî, tu çareserî nehatiye dîtin. Hevserokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê,Telal Mihemed diyar kir ku beyannameya Rêveberiya Xweser bingeha çareserkirina kirîza Sûriyê ye.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Kirîza Sûriyê 12 sal li pey xwe hişt û roj bi ro kirîz kurtir dibe, hikumeta Şamê û hevalbendên wê; Rûsiya û îran, herwiha dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, herdem ji bo berjewendiyên xwe hewil didin ku temenê kirîzê dirêjtir bikin û li ser xwîna gelên Sûriyê bazarên qirêj dikin.

Di van 12 salên kirîzê de, ji bo peydakirina çareseriyê bi 10’an civîn û danûstendinên navneteweyî hatine li darxistin, lê ji ber ku hêzên di van civînan de beşdar dibin nûnertiya gelên Sûriyê nakin û tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dikikn, tevahiya van civînan bê encam dimînin. Mînakê li ber çavan jî civîna Astana ya dawî ku di 20’ê pûşberê de hat lidarxistin û bê encam ma.

Li aliyekî din jî ji bo çaresrkirina kirîza Sûriyê, Rêveberiya Xweser ku tevahiya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê di nava xwe de dihewîne, gelek gavên girîng avêtin, herî dawiyê di 18’ê Nîsanê rêveberiyê Benameyeke ku ji 9 xalan pêk tê, ragehand, li gorî siyastmedar û lêkolînerên siyasî ev beyanname ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê çareseriye.

Derbarê Beyannameya Rêveberiya Xweser a çareserkirina kirîza Sûriyê hevserokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanê, Telal



Mihemed ji rojnameya me re axivî.

## ‘Beyanname Rêveberiya Xweser bingeha çaresekirina kirîza Sûriyê ye’

Mihemed da zanîn ku Beyannameya Rêveberiya Xweser di xizmeta hemû gelên Sûriyê de ye û wiha domand: “Ji destpêka ku Rêveberiya Xweser hatiye damezrandin, hewildanên wê ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê bi dawî nebûne. Di vî warî de jî heya niha jî deriyê diyalogê bi hikumeta Şamê û opizisyona sûrî re nehatiye girtin. Herî dawî jî Beyannameya Rêveberiya Xweser bû. Ev beyannameya ku ji 9 xalan pêk tê ji bo gelên Sûriyê beyanameyeke demokrat e. Herwiha mafê hemû pêkhatiyên Sûriyê diparêze û bingeha çareserkirina kirîza Sûriyê ye. Ev beyanname girîng e, ji ber ku bi awayekî zelal ji bo çareseriya kirîza Sûriyê ya siyasî ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hata pêşkêşkirin. Di heman demê de divê beyannameya Rêveberiya Xweser ne li dijî biryara 2254 ya Encumena Navnetewî ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê be. Di vê pêngava hestiyar de jî divê çavê çavên hikumeta Şamê û opizisyonê ne li dewletên weke Rûsya, Tirkî û hwd… be. Hem jî hikumeta Şamê û opizisyona Sûriyê vê beyannameyê paşguh nekin. “

## ‘Gelên Sûriyê sûd ji civînên hêzên navdewletî negirtin û nagirin’




Telal Mihemed destnîşan kir ku civînên bi riya hêzên Navdewletî yên desthilatdariya wan li ser Sûriyê heye bi tên lidarxistin nakeve xizmeta gelên Sûriyê de û wiha got: “Bi dirêjahiya kirîza Sûriyê re hêzên navdewletî yên wek Rûsya, Îran, dagirkeriya Tirkî û herwiha hikumeta Şamê û opizisyonê bi dehan civîn li dar xistine. Herwiha nûnerên gelên Sûriyê di civînên weke Asatana, Sûtşî û Cinêvê de tune bûn. Rêveberiya Xweser ya ku berî hemû aliyan ji bo azadiya gelên Sûriyê û çareserkirina kirîza Sûriyê kar dike, nehat beşdarkirin. Yek ji van hêzan ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê Sûriyê kar nedikir. Lê belê ji bo berjewndiyên xwe yên desthilatdariyê û dagirkeriyê li hev diciviyan. Lewma jî ev civîn bêencam man û gelên Sûriyê sûd ji van civînan negirtin û nagirin jî. Em weke partiyên siyasî yên Rojava û Sûriyê dibînin ku beyannameya Rêveberiya Xweser nimûneyeke rast ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê ye. “

## ‘Çareserkirina kirîza Sûriyê li dijî berjewendiyên hikumeta Şamê ye’

Mihemed anî ziman ku hikumeta Şamê naxwaze kirîza Sûriyê were bidawîkirin û wiha domand: “Piştî ku 12 sal li ser kirîza Sûriyê derbas bûn hişmendiya hikuumeta Şamê nehat guhertin. Lê belê hemû cureyên binpêkirnên der mirovî di derheqê gelên Sûriyê de pêk anîn. Di heman demê de Rêveberiya Xweser ji bo çareserkirina pirsgirêkên gelên Sûriyê gelek rêbazên çareseriyê ji hikumeta Şamê re diyar kiriye. Lê heta niha jî hikumeta Şamê li ser hişmendiya beriya kirîzê ye û dîsa dixwaze rewşa Sûriyê vegere weke rewşa beriya 2011’an. Lê hikumeta Şamê ji bilî nerînên xwe nerîneke din û çareyeke ku bikeve xizmeta gelên Sûriyê jî qebûl nake. Em weke xemxurên gelên Sûriyê eşkere dikin ku beyannameya Rêveberiya Xweser beyannameyeke demukrat e û wê guhertin û pêşketinan ji hemû aliyan ve bi xwe re bîne. Herwiha bang li hemû aliyên niştîmanî yên Sûriyê dikin ku tevlî diyaloga çareseriya kirîza Sûriyê bibin. Di heman demê de jî divê kar û xebatê ji bo berjewendiyên hêzên ku desthilatdariya wan li ser gel û xaka Sûriyê heye, nekin. “

# ‘Serkeftin para gerîla ye’

**Pisporên ji Misirê çalakiyên gerîla yên li dijî artêşa Tirk a dagirker silav kir û got: “ Serkeftin wê para gerîla be.”**

Pisporên ji Misirê têkildarî berxwedana gerîla ya li hemberî êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Herêmên Parastinê axivîn.

Nivîskar û şîrovekarê siyasî Îbrhaîm Şaban diyar kir ku çalakiyên serketî yên ku gerîla li dijî leşkerên artêşa Tirk a dagirker pêk tîne û cezakirina bi dehan leşkerên Tirk delîlê binkeftina stratejiya Tirkiye ya dagirkirina welatên din e.

Îbrahîm Şaban her wiha anî ziman ku çalakiyên serketî yên gerîla wê hêzên dagirker neçar bike ku hesabên xwe li ser herêmê di ber çavan re derbas bike û got: “Ev çalakî derseke dijwar ji bo rêveberiya siyasî ya Tirkiyeyê ye ku siyasetên wê yên dagirkirina deverên din û înkarkirina mafan bi bin ketine.’’

Şaban got, ji bilî naskirina mafên gelê Kurd û rawestandina siyasetên qirkirinê yên binkeftî tu rê li pêşiya dewleta Tirk nine.

Şaban diyar kir ku çalakiyên dawîn ên bi bandor ên gerîla binkeftina stratejiya Tirkan û bêkêrhatibûna wê îsbat dike.

Îbrahîm Şaban bang li civata navneteweyî kir ‘’Li hemberî sûcên dewleta Tirk a dagirker rabe û nameyekê bidin Erdogan ku Osmaniya nû binkeftî ye û serdema dagirkeriyê derbas bûye. Divê civata navneteweyî nameyê bide Erdogan bila girîngiyê bide welatê xwe tenê û tevahî mafên Kurdan nas bike.”

Şaban destnîşan kir ku ew ji bêdengiya navneteweyî ya li hemberî sûcên dewleta Tirk a dagirker ên li bakurê Sûriye, Başûrê Kurdistanê û başûrê





**Îbrahîm Şaban**



**Elî Ebû El Xêr**

Tirkiyeyê matmayî ye ku van sûcan li ser masaya Meclisa Konseya Ewlekariyê ya Neteweyê Yekbûyî nîqaş nake.

Dîroknas Elî Ebû El Xêr jî anî ziman ku çalakiyên gerîla yên li dijî artêşa Tirk a dagirker di navaroka xwe de çalakiyên bi bandor in.

Ebû El Xêr bal kişand ser derbên ku artêşa Tirk bi destê gerîlayan xwarine û wiha pê de çû: “Tevî ku dengeyên her du hêzan ne wekî hev in, lê artêşa Tirk a dagirker 32 leşkerên xwe ji dest da û droneke wê ket xwarê. Ev dide îsbatkirin ku heq heq e û neheqî neheqî ye. Di aliyê derfetan de ferqeke mezin di navbera gerîla û artêşa Tirk de heye. Artêşa Tirk xwedî hêzeke leşkerî ya xurt e û balafir, tank û obîsên wê hene. Di heman demê de dewleta Tirk endamekî NATO’yê ye. Lê gerîla bi çekên xwe yên sivik dikare li hemberî hêza nemerd a Tirk bisekine.”

Elî Ebû El Xêr hişyarî da ku bikaranîna çekên kîmyewî yên ji aliyê dewleta Tirk ve xetere ye û got: “Ev tê wateya ku artêşa Tirk bi rêya bikaranîna çekên kevn nikare tu serkeftinan bi dest bixe. Di dawiyê de wê heq an ku hêzên gerîla bi serkevin.” **ANHA**



# Xeteriya hişmendiya DAIŞ’ê

Zarokên çeteyên DAIŞ’ê yên kampa Holê ku li ser hişmendiyeke terorî ji aliyê jinên çeteyan ve tên perwerdekirin, ji bo siberoja herêmê û tevahiya cîhanê xeterin. Ji bo dûrxistina zarokên çeteyan ji hişmendiya terorê, Rêveberiya Xweser 3 navendên perwerdekirinê ji van zarokan re vekirin.

**Hemze Sêvo/ Qamişlo**

Piştî têkbirina çeteyên DAIŞ’ê li Baxozê , di sala 2019’an de ji aliyê Rêveberiya Xwerser ji bo malbatên çeteyên DAIŞ’ê kampa Holê hat hazirkirin. Piraniya kesên ku cihê xwe di vê kampê de digirin hevjînên çeteyên DAIŞ’ê û zarokê wan in. Herwiha niha jî hejmara wan bi giştî, 48 hezar û 394 kes e, bêtirî 30 hezar ji wan zarok in û temenê wan 2 salan heya 17’an e. Piraniya van kesan bianî ne û ji hemû dewletên cîhanê bi çeteyên DAIŞ’ê re derbasî Sûriyê bûn. Niha jî ev kesên xwedî fikrên radîkal û terorî ku xeteriyeke mezin li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê çêdike. Di hundirê kampa Holê de, bi taybet jî zarokên çeteyan di atmosfereke ne guncav û di bin perwerdeyeke fikrî ya terorî de jiyan dikin. Civaka navdewletî jî di derbarê vê yekê de bê deng e û alîkariya Rêveberiya Xweser nake. Bi taybet Dewletên ku welatiyên wan di vê kampê de dimînin.

## Hejmarên jin û zarokên ku radestî welatên wan hatine kirin

Li gorî Desteya Rêveber A pêwendiyên Derve ya Rêveberiya Xweser, hejmara jin û zarokên çeteyên DAIŞ’ê yên ku Rêveberiya Xweser radestî dewletên wan kiriye jî wiha ye:

Di sala 2019’an de, 174 zarok û 168 jin radestî welatên wan hatin kirin.

Di sala 2020’an de, 245 zarok û 36 jin radestî welatên wan hatin kirin.

Di sala 2021’an de, 258 zarok û 66 jin radestî welatên wan hatin kirin.



Di sala 2022’an de, 388 zarok 129 jin radestî welatên wan hatin kirin.

Di sala 2023’an de, 256 zarok û 115 jin radestî welatên wan hatin kirin.

## Navendên perwerdekirnê ji bo zarokên çeteyan hatin vekirinê

Hejmara kesên bo dewletên wan hatine radestkirin li gor hejmara kesên di kampê de dimînin, pir kêm e. Malbatên çeteyên DAIŞ’ê yên ku di Kampa Holê de ne mîna bûmbeyekê ne û xeteriyekê mezin li ser tevahiya cîhanê çê dikin, bi taybet zarokên ku li ser fikrê DAIŞ’ê tên mezinkirin. Ji bo dûrxistna zarokên çetyeyan ji hişmendiya DAIŞ’ê, Rêveberiya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyê 3 navendên perwerdekirin vekirin. Yek ji van navendan Navenda Horî ya ji bo perwerdekirina zarokên çeteyên DAIŞ’ê ye, ev navend li bajarokê Til Mei’rûf yê girêdayî navçeya Tirbespiyê ya bajarê Qamişlo ye. Herwiha di sala 2017’an de hat vekirin. Zrokên di vê navendê de dimînin bi navê Eşbal Elxîlafe tên naskirin. Di navendê de 110 zarokin û herî kêm ji 22 welatan in. Temenê wan ji 12 heya 18-salî ye. Piraniya van zarok û sîpeyan bi çeteyên DAIŞ’ê re sûcên mezin kirine. Herwiha Navenda Helat jî yek ji navendên ji bo perwerdekirina zarokên çeteyên DAIŞ’ê, di sala 2021’ê de hat vekirin. Navenda Helat ya Perwerdekirina Zarokan li bajarê Hesekê ye. Ev navend li gorî temenê zarokan dibe 3 beş, Zarokên ji temenê 3-salî heya 13-salî li van beşan tên belavkirin.

Têkildarî Kampa Holê û navendê perwerdekirina zarokên çeteyên DAIŞ’ê hevseroka Kampa Holê Cîhan Henan û rêveberên navendan perwerdekirina zarokan , herwiha zarokên çeteyan ku li navendan tên perwerdekirin ji rojnameya me re axivîn.

## ‘Fikrekî radîkal yê herî xetrnak di kampê de ye’

Cîhan Henan diyar kir ku malbatên DAIŞ’ê yên Kampa Holê xeteriyeke mezin li ser ewlehiya herêmî û cîhanî çêdikin û wiha got: “Piştî ku hêzên QSD’ê çeteyên DAIŞ di pêngava Baxozê detêk birin, êdî em neçar man ku hejmareke mezin yên malbatên çeteyan di Kampa Holê de bi cih bikin. Herwiha ji destpêka sala 2019’an ve van kesan gelek pirsgirêk di kampê de çêkirine. Di heman demê de hêzên ewlekariyê jî kirina armanc. Di sala 2022’yan de pêngaveke ewlehiyê li kampê hat lidarxistin û di encamê de gelek cureyên çekê giran ji nav kapê hate desteserkirin. Ev kamp weke navenda fikrên radîkal ya herî xeternak e. Jinên di vê kampê de, kesên sîpe vedişêrin û her yek ji wan 4 car û bêtir jî dizewicênin. Ew bi vê yekê dixwazin ku çeteyên DAIŞ’ê ve vejîn bikin. Li hemberî vê xeteriyê, welatên ku ev çete jê hatine , xwe bêdeng dikin û bi erka xwe ya exlaqî ranabin.Herwiha civaka navdewletî jî ji di derbarê çareserkirina vê pirsgirêkê naxebite. “

## ‘Dayîk zarokên xwe li ser fikrên terorê mezin dikin’

Rêvebera Navenda Helat jî da zanîn ku di Kampa Holê de dayîk zarokên xwe li ser fikrên tundî perwerde dikin û wiha domand: “Li Kampa Holê zarokên DAIŞ’ê ne di atmosfereke guncav de dijîn. Dayîk di hişmendiya zarokên xwe de fikrên terora çeteyan diçîne. Em jî neçar bûn ku rê li ber vê yekê bigirin. Ji bo ku zarok mafê xwe yê zaroktiyê bibin û dûrî hişmendiya DAIŞ’ê bikevin, navenda me van zarokan perwerde dikin. Herwiha hejmara wan jî 40 zarok e lê carcan dighêje zêdetirî 100 zarokan. Jinên ku pirsgirêkên ewlekariyê li ser wan hebin dikevin girtîgehê de. Zarokên wan jî divê bi wan re derbas nebin. Lewma ev zarok ji bo perwerdekirinê bi riya Desteya Jinê tên navendê. Erkê me erkekî mirovî ye, em dixwazin zarokên xwedî fikrên radîkal bi vî awayî mezin nebin, lê belê li ser perwerdeyeke asayî werin avakirin. Mamosteyên taybet ji bo vê perwerdekirinê hene weke bîrkarî, wênesazî, werzîş û hwd… . Herwiha piştî ku dayîkên zarokan ji girtîgehê derdikevin, zarok jî bi dayikên xwe re vedgerin Kampa Holê. “

## ‘Zarokên çeteyan wek DAIŞ’ê tevdigerin’

Rêveberê Navenda Hûrî diyar kir ku zarokên DAIŞ’ê bi hişmendiyeke çeteyan tevdigerin û wiha axivî: “Piraniya van zarokên ku niha li Navenda Hûrî dimînin di şeran de hevkariya çeteyên DAIŞ’ê kirine. Di heman demê de destê wan di kuştina gel û şervanên me de heye. Zarokên wiha li ser perwerdeya DAIŞ’ ya herî rik û tundwar fêr bûne. Di dema niha de jî wisa ne, ku hîna bi sîstem tevdigerin. Di navendê de ji xwe re mîrek dest nîşan kirine û tev di bin siya wî de ne. Ev tişt ne tenê li navenda Hûrî derbasdar e, lê belê li Kampa Holê rewş ji wisa xirabtir e. Li kampa Holê hejmara zarokên wisa xwedî fikrekî radîkal bi hezaran in. Tev jî di temenekî biçûk de bi 3 yan 4 jinan re di temenekî biçûk de dizewicin. Em li vê navendê hin bi hin dixwazin nêzî van zarokan bibin û fikrên zarokên normal di hişmendiya wan de biçînin. “

Her zarokekî ku di hundirê Kampa Holê, Navenda Helat û Hûrî de ye de dimînin, li ser tevahiya cîhanê xeterin, li gorî ku me şopand hîn jî ev zarok li ser hişmendiya çeteyên DAIŞ’ê tevdigerin.

# Helîkopterên bi erdê re dimeşin Mala Barzanî

**Volqan Elî**

Di roja me ya îro de zanist û teknîk her roj û her kêlî wisa bi pêş dikeve, ji hemûyan agahdar bûn û şopandin ne gengaz e. Mînak, ev balafirên bê mirov û bi armanca îstixbaratê înterneta bi hezar cûreyî tê bikaranîn ji beriya mirov wan bişopîne, jixwe ew mirov dişopînin. Li gorî ku di nûçeyeke tv’yekê de digot, li welatê Sînê seyareyek (taksî) hatiye çêkirin, ne di erdê re diçe, li azman difire û wisa rêwîtiya xwe dike. Pêşketina teknîk û zanistê bi serê xwe ne xirab e. Wekî di mînaka dawî de xuya ye, ji bo civakê baş e.

Dîsa rojevek girîng jî di vê dawiyê de ji ber salvegera 100mîn a peymana Lozanê, civînên hêzên şoreşger KNK`ê û hwd hebûn, PDK`ê (Mala Barzanî) tevlî nebû. Jixwe nedikarî tevlî bibin. Ji ber ku giranî û helwesta xwe ya herî piçûk a welatparêziyê ji dest dabûn. Ji derveyê vê hemû hêz û derdorên demareke şoreşgerî û Kurdîtî tê de heye tevlî bûn. Ya din jî Tayip beriya vê çendekê banî Begler Begê Mansûr kiribû û wezîfeyeke nû dabû wî, Lazim bû mêrxasên



Barzaniyan di bejahiyê de jî alîkarî bidana leşkerên Tirk. Li ser vê yeke, mêrxasên vê Malê, li Xakurkê tevlî operasyonên dagirkeriyê bûn. Dijmin bi xwe jî vala nesekinî. Li hemberî Bakur û Rojhilatê Sûriye û herêmên Parastina Medya êrîş da destpêkirin. Bi taybetî jî hewl da êrîşên li ser Zap, Avaşîn, Metîna nûjen bike, cihên nû bigire û cihên par jê kişiyayîbû ji nû ve bigire. Xwest leşkerên xwe daxe sêgoşeya Zap, Metîna û Garayê yanê Girê Cudî, Girê Şehîd Delîl. Li girê Cûdî gerîlayên azadiya Kurdistanê nehiştin ku helikopter leşkeran daxin. Dest werda, di destpêkê de 3-4 leşker kuştin. Derb li çend helîkopteran dan. Dema artêşa Tirk hewl da ji bo rakirina kuştiyên xwe û hem jî ji bo daxistina leşkeran, gerîla dîsa lêda. Her lêdana gerîla hem pêşî li firehbûna dagirkeriyê girt û hem jî nehişt ku artêşa dagirker kuştî û birîndarên xwe rake. Ji bo dewleta Tirk helikopter jî amûrekî cûda ye ji bo şer, ji leşkerên wî girîngtir e. Jixwe par Tayip di axaftinên xwe yên propagandayê de digot: “Ma hûn dizanin guleyek bi çend lîrayan e?” Her wisa helîkoptereke şer jî ne kêmtirî dehan milyon dolar e.

Dema wisa bû, hûn ê bêjin çi qewimî? Em vê bi gotineke pêşiyên Kurdan bînin ziman. Dapîr û bapîrên me gotine: “Zor dizane, zêr dizane, devê tifinga mor dizane.” Wekî vê gotinê, zora tifinga gerîla jî bûyê sedem ku ‘ilm û teknîka Tayip bi pêş bikeve. Wekî tê guhên me, xwendekar dibêjin: “ma bû çê?” wisa nebêjin. Wele Tayip helîkopterên nû bi pêş xistiye. Ev ne li azman difirin. Bi erdê re dimeşin,Mala Barzanî.

Artêşa dagirker a Tirk dixwaze, koka Kurdan biqelîne. Yek kesî bi namûs û şeref nehêle. Ji bo vê yekê hemû Nato û dewletên kedxwar û dagirker bi hemû ilm û zanista xwe li pişta wî ne. Rojane alîkariyê didinê. Teknîka herî pêşketî baxişandinê. Jêr dibêjin “ruhê Kurdan bistîne, em bi te re ne”. Na, têrê nake. Lê belê Mala Barzanî jî xwe li ser vê alîkariyê zêde kiriye. Ne ji van helîkopterên bi erdê re dimeşe be, îrade û cesareta gerîla di binê dehan keşfan de, li hemberî çendîn û çendîn teknîkên herî bi pêşketî nahêlin lingê helîkopterên difirin ên Tayip jî bi erdê bikeve.

Gotineke pêşiyan a Tirkan heye dibêje: “Zilamekî mêrxas bikuje, lê tenê heqê wî nexwe!”. Bi rastî jî lazim e mirov heqê Mala Barzanî jî nexwe. Ma dema leşkerên Tirk li serê Girê Cûdî yan jî cihekî cûda yê Parastina Medya tê kuştin kî yê termî wan rake? Jixwe gerîla nahêle lingê helîkopterên li azman difirin bi erdê bikeve.

Ji xwe ji Enqerê Tayip li têlê dabû,“Eger di azman re nabe, bila begler begeyê me yê nû Mala Barzanî , kurên wî yên mêrxas di erdê re biçin hawara leşkerên me, eger ne bi birîndarî be bila candekên wan bînin.”

Mala Berzanî ma wê çawa, ev daxwaza Siltan Tayip li erdê bide? Yek, nekir du. Çawa ku kurên wan ên mêrxas bi pişta xwe ji leşkerên li dîjî gerîla şer dikin re av, nan û xwarin dikişand, lazim dikir birîndarên wan sax bikirana, candekên wan bikişandana Kanî Masî, Şeladizê û gundên li derdorê. Eger na, Enqere pir dûr bû, xwedê neke leşkerekî birîndar bimana ew ê kî li hemberê gerîla şer bikira? Kê wê mala Kurdan xira bikirin? zarokên wan ên wekî pezkûvî û xezalên çiya bêguneh bi çekên kîmyayî bixeniqanda? Kê wê çekên teknîk ên atomî biteqandana? gerîlayên di hemêzên wan de devê tifinga mor heyî, bi ser de teht û zinar bi anîna xwarê û di binê erdê de bihiştana?

Van hemû pirsan mejiyê Begler Begê Mala Barzanî dixwar. Jixwe beriya dehê salan biryara vê dabû; “Eger skorsky di ezman re nikarin, pêwîst e kurên me yên mêrxas di erdê re xwe bigihînin hawara mehmetçîkên (leşker) qehreman. Divê (kuştî yan birîndar) qunçek ji qemîse wan jî zerer nebîne.”

Ma şivanek çima li ber deriyê xwe kuçik dihewîne?